



Her carekî ku tu embalajek yan jî rojnameyek bikarhatî (kevin) datîni cîhên komkirina wan ji bo ku ji nû ve bîn bikaranîne, tiştê gelek mezin diqewime. Qapaxa kevin ya şûşeyek tê guhertin û dibe sominê cîwatayê. Pakêta dermana cilşuştinê (deterjanê) dibe paketek xweşik ya pêlavan. Rojnameya xwendî, dibe rojnameyeke nû. Bi vî awayî tu dibî alîkarê taserufa miqdareke mezin ya enerjîyê. Her weha tu dibî sedem ku îmkânên xwezayî ji dewrûdaîma (sîrkulasyon) xwezayê dernakevin. Bi saya te jîngeh qezencek mezin dike. Bi vî yekê re tu jî qezenc dikî. Her carek tu bi xwe ji nû ve qezenc dikî!

Embalaj û rojname di dewrûdaîme-kê de

Hemû embalaj û rojnameyên ku tên komkirin ji nû ve bi şeklê embalajên yan jî berhemên din yê nû tên bikaranîn. Embalajên plastîk dikarin, ji bendên dengkêmkirinê û firçeyên firaqşuştine bigre heta seqsiyan, bibin gelek tiştên nû. Cam, kaxizên bi îzolasyon û pakêtên ji kaxiz berî her tiştî, ji nû ve dibin embalaj. Pakêtên ji metal dikarin bibin rêyên hesinî, karoserê erebeyan û gelek tiştên din. Rojnameyên xwendî dibin kaxizên rojnameyên nû!

Berpirsiyariya derhêner

Hikûmet biryar daye ku hemû şirketên ku embalaj çêdikin, îtxal dikin, dadigrin yan jî difroşin yan jî tiştên embalajkirî difroşin, berpirsiyarê avakirina sistemeke wisa nin ku, bikarênerên dawî yê van berheman, bikaribin van embalajan ji bo ji nû ve bikaranîne li cîhekî ji bo komkirinê deynîn. Ji vî yekê re Berpirsiyariya Derhêner tê gotin. Ev tişt ji bo rojnameyan û kaxizên wergerbar (retur) jî derbas dibe. Yê ku kaxizên rojnameyan çêdikin yan jî îtxal dikin û rojname çap dikin yan jî îtxal dikin jî berpirsiyar in ku sistemek ya cîhên komkirinê ji bo ji nû ve bikaranîna kaxizên wergerbar hebe. Embalaj û rojname du berhemên pêşî nin ku ji bo wan berpirsiyariya derhêner hatîye tesbîrkirin. Ew beşek mezin yê ji çopên ji malan derdikevin pêk tînin û miameleya wan nisbeten hêsan e. Derhênerên embalajan û kaxizên wergerbar di nav xwe de pênc şirketên malzemeyan ava kirine ku ew bi hev re li bin navê Föropacknings- och Tidningsinsamlingen (FTI) hevkarîyê dikin. Hemû karên wan bê armanca qezencê tên birêvebirin.

Îstasyonên ji nû ve bikaranîne

Derhêner (FTI), li seranserê welat ji zêdeyî 5 800 îstasyonên ji nû ve bikaranîne berpirsiyar in. Ji bo avêtina rojnameyan, embalajên ji plastîk, kaxiz, metal û cam divê tu biçî wê derê. (Li wan deran gelek caran qabên komkirinê ji bo pîl û cilan jî hene.)

fti FÖROPACKNINGS
& TIDNINGS
INSAMLINGEN

www.ftiab.se, tel 0200-88 03 11

* Navenda komkirina embalaj û rojnameyan

Jihevveqetandina embalajan

Hemû embalaj divê vala û paqijkirî bin. Embalajên ji madeyên cuda çêkirî, divê ji hev bîr veqetandin. Eger jihevveqetandina wan madeyan ne mimkin be, embalajê li gora madeya herî giran veqetîne.



EMBALAJÊN PLASTÎK

Embalajên ji plastîkê hişk

Mînak: şûşe, qûfî, bîdon û satilên biçûk.

Embalajên ji plastîkê nerm

Mînak: torbeyên plastîk, paketên refil, tûb, torbeyên çîpsên kartolan, frîgolît, folîoya plastîk û filîm.

Wisa bike: Berhevkirina embalajên ji plastîkê hişk û nerm li hemû îstasyonên ji nû ve bikaranînê hene, lê şiklê berhevkirinê bi dido awayî ne. Yan ew di heman qabî de têne berhevkin, ku gelek caran bi vî awayî dibe. Yan jî embalajên plastîk yê hişk û yê nerm ji hev cuda di qabên cuda de têne bi cîh kirin. Qaydeyên li şaredariya te derbas dibin li ser qabên berhevkinê hatine nivîsandin. Heman qayde ji bo berhevkirina li ber mala tu lê rûdinî jî derbas dibe. Qapax û tapeyan derxin. Hemû embalajên plastîk bi serê xwe, ne di hundirê torbeyê de, bavêjin. Ev, ji nû ve qezenckirinê hêsantir dike.

Dîqet! Tiştên plastîk yê ku ne embalaj in (weke mînak, mobîlya û leyîstok), li cihên ji bo çopên malê (hush-allsavfall) yan jî li çopên mezin (grov avfall) tîn avêtin. Şûşeyên plastîk yê veqerbar, bi heqê xwe li dikanan tîn danîn.



Embalajên kaxez

Mînak: torbeyên şekiran, paketên maqarneyê, kaxezên ji bo diyariyan, paketên şîr û ava fêkiyan, qartonên pêlavan, meqareyên kaxezên tuwalatê, kaxezên embalajê yê cd/pirtûkên ji siparişên bi rêya posteyê û qutiyên ji kaxezên izolekirî.

Wisa bike: Wan bipelixîne û bitewîne. Embalajên biçûk têxe hundirê yê mezintir.

Dîqet! Zerf bi çopên malê re tîn avêtin (yan jî, eger hebe, li beşa şewatbar) Rojname, weşanên reklaman û yê mîna wan li qabên ji bo rojnameyan tîn bi cîh kirin.



EMBALAJÊN METAL

Mînak: Qutiyên konserve, qutiyên spray, tûb, qapax û tape, qutiyên boyaxan bi boyaxên hişkbûyî û folîo û formên ji alîmînyum.

Wisa bike: Qapaxên tuj yê qutiyên konserveyan ber bi hundir ve bidin. Qapaxa tubên xewyar li ser bihêlin.

Dîqet! Qutiyên ku boyax û zemq tê de mabin weke çopên talûke li îstasyonên jîngehê (miljostation) tîn avêtin. Xurdeyên metal, perçeyên tesîsatî, tawe û tiştên din yê metal ku ne embalaj in bi çopên malê yan jî yê mezin re tîn avêtin. Qutiyên vexwarinan yê ji alîmînyum bi heqê xwe li dikanan tîn danîn.



EMBALAJÊN CAM

Mînak: şûşe û qutiyên ji camên rengîn û bê reng.

Wisa bike: Qapsûl, qapax û tapeyan derxin û ji bo ji nû ve bikaranînê li gora madeyên wan ji hev veqetînin.

Dîqet! Şûşeyên veqerbar yê 33 û 50 cl bi heqê xwe li dikanan tîn veqerandin. Porselen, seramik û camên din ku ne embalaj in bi çopên malê yan jî çopên mezin re tîn avêtin. Ampul û lambeyên floresan nikarin li qabên ji bo berhevkirina caman bîr avêtin. Wan bibin navendên ji nû ve bikaranînê yê şaredariyê. Ji bo bêtir agahî bi şaredariya xwe re têkilî deyne.



ROJNAME

Mînak: Rojname, kovar, katalog, pelên reklaman, broşûr û kaxezên nivîsandin/xêzkirinê.

Wisa bike: Beriya ku weşanên çapkirî bavêjin qabên komkirinê, torbeyên naylon û pelên reklaman yê zeliqandî jê veqetînin.

Dîqet! Zerf bi çopên malê re tîn avêtin (yan jî, eger hebe, li beşa şewatbar).